Nawişk

Lawaziya xwandina derve ya rewşenbîran pirsgirêkek din li rewşenbîriya me zêde dike

Tehsîn Navişkî

Li pey pêzanînên ku min hene, piraniya nivîskar û wêjevan û hunermendên me yên li ser lîstê rewşenbîran dihên tomarkirin li malên xwe pirtukxaneyên taybet bi her qebareyekî bin hene. Di ne piraniya van rewşenbîran her mehê pitir ji pirtûkekê ji bilî rojname, heftîyaname û kovarên hemecor li pirtûkxane ya xwe zêde dikin.

Pirsyara li vir xwe disepîne , erê ev rewşenbîrên me yên xwediyên van pirtûkxaneyan çiqas ji van pirtûkên bi dirêjiya meh û salan toz li ser ketiye dixwînin? Bi nêrîna min bersiv eşkera ye. Dibe rewşenbîr ê me îro bi behane ya rewşa aborî ya nebaliber û şorişa teknolojî û rewşa na asayî ya Kurdistan ê bi giştî rêza pitir ê ji pirtûkên pertûkxane ya xwe naxwînin û dibe çav şandinê jî lê nakin heya rojname û kovarên rojane jî digehîne ber destî, dibe bi tenê manşetan dixwînin yan naxwînin! Wekî ez têdigehim ev diyardeyek a tirsnak e. Heke ji bo em têne hînine derê guman tê de tune ye wê li ayideya bandora xwe ya nerênî li ser rewşenbîrî ya gelê me hebe.

Bi mêzekirina min xwandina pirtûkan bi şêweyekê rêkûpêk û akademî bi her core hebin bi rêka enternetê be yan bi rêkên normal be xwarina hizra mirovî ye. Ka çawa me zîke wek xwarina giyanê wî mirovî dihê tomarkirin. Evcar her hizreka ji vê xwarinê bê behr bibe yan kêm werbigire dawiyê bivê

nevê wê pêdivî gencîneya hizrên kevin bibe wek benîşt, dûbare wê bicû.

Ez bawer dikim ev renge rewşenbîr e li dawi yê wê tûşê nexweşi ya vala ya hizirî bibe. Helbet li vê derê êdî nikarin peyama xwe ya pîroz bigehînin û pêvajo ya welatê xwe ber bi armancên hevçerx û şaristanî bajon.

Wilo dihê gotin çaxê rewşenbîrî ya her welatekî dikeve di vê pirsgirêk a domdirêj de, şareza û berpirsên wî welatî her zû radibin û dûvçûnên akademî dikin û rapirsîn û vekolînên berdewam di gel dana semîner û workşopên hemereng peyrew dikin heya bigehine encamên durist û li çareyan digerin.

Ji ber ku welatên pêşkevtî yên xwedî azmûnên nû çaxê pirsgirêka xwendinê li cem xwendevanê wan peyda dibe, berî bigehe rewşenbîrê wan, wek berhemdarê wî xwendevanê berhemên wî dixwîne hest bi lêdana zenga metirsi yê dike ku neviyên ayindê wî welatî tûşbibin û li dawiyê welatê wan li dawiya karwanê pêşkevtina cîhanê bimîne.

Lê mixabin û sed carên din mixabin nuke nexweşiya lawaziya xwendinê wek penqa pêzanînên rewşenbîrî û xwarina wî ya hizrî piraniya rewşenbîrên me yên xwe bi nivîskariyê û wêjevaniyê û hunermendiyê didine niyasîn vegirtîne û çi nîşanên zorînê li asoyê eşkere bînin… Dibe her kesê ageh jê tuneye diyardeyeka weha qada rewşenbîrî ya me dagirkiriye.

> Pirsyara li vir xwe disepîne , erê ev rewşenbîrên me yên xewdiyên van pirtûkxaneyan çiqas ji van pirtûkên ku bi dirêjiya meh û salan toz li ser ketiye, dixwînin?

Bi nêrîna min ne tiştekê biçûk e îro xwendina rewşenbîrên me yên ku xwe bi ala hilgirên pêşkevtin û guhorînan didine niyasîn ji xwendina pirtûkên rewşenbîrî ber bi xwendina hinek manşet û sitûnên kurt yên weşanan û çavxişandinên saytên internet ê bi nave çaxê lezî û teknoloji ya efsaneyî biçin! Divê her ji nuke layenên peywendî bi vê pirsgirêka mezin ve heye bi zûtirîn dem dûvçûna vê mijarê û vê pirsgirêkê bikin û çareyên zanistî jê re bibînin. Heke bi vê rewşa nuke rewşenbîr ê me tê de derbas dibe welatê me yê perçekirî her wê bimîne di rewşeka kambaxtir ê de.